



Kurdocide Watch

Organîzasyona mafê mirovan ya li dijî Jenosîdê
Navenda Helebceya Şehîd ya li dijî jenosîdên Kurda û Enfalê- CHAK

CEZAKIRINA ZAROKÊN KURDA RAWESTÎNIN

Ji sala 2006 ve, piştî guhertinên di "qanûna li dijî terorê", 5000 zarokên Kurd, bi giranî li bakurê Kurdistanê bajarên Amed, Êlih, Şirnex, Wan, Colemêrg, Sêrt, Mêrdîn û hin bajarên Turkiyê, ji ber sedemên beşdarbûna xwenîşandanên fermî, ku ji aliyê dezgeh anjî partiyên siyasî (bi taybetî yên DTP/BTP ê) hatine pêkanîn, tevlihbûna zarokan ji bo definkirina kesên canê xwe jidest dane, hildana sloganên, nîşandana serkevtinê bi tiliyên xwe, stiranbêjî, dîlan kişandin, li çepikdayîn û xwêdan bûyinê, bêyî ku peymanên navnetewî li ber çava bêne girtin, bi destê hêzên ewlekariya Turkiyê hatin girtin. Zarokên ku temenê xwe 12-18 ne, piştî ku di navendên hêzên li dijî terorê demek dirêj girtî man, teslîmî şaxên zarokan kirin. Îfadeya zarokan ji aliyê dadgerên taybetî yên CMK ê ku qanûna 250 bicîh dihênin, hatiye girtin, paşê di dema lêpîrsinê, hakimên taybetî biryara hepiskirina wan da. "Dadgehên Cezeyên Giran (navê berê DGM bû û ji bo dadgehkirina mezinan e)" li dijî zarokên Kurda bi sedema "sucên rêxistinî" û ji ber "propogendeya rêxistinî" bi dehan salan hepis, hatine cezekirin. Pêkanîna dadgehên Turkiyê, îro jî bi heman şeweyê didome. Girtina zarokan bi şeweyekî hişk pêk tê. Paşê, qonaxa zarokên girtî bi îfadegirtin, dayîna cezeyên giran û xistina hepsê didome.

Zarokên Kurda, ji aliyê polîsan ve bi rêya hişkî û îşkencekirinê têne girtin. Li dijî wan muameleyên xirab têne bikaranîn. Sînorkirina azadiya wan ne weke çareya dawî tê bikaranîn.

Şert û mercên zindanan li derveyî normên cîhanê û jiyane ne. Mayîna di destê polîsan de demek dirêj digire û mîna sîstema cezekirinê tê bikaranîn. Ev helwest û kirin tev, li dijî belge û peymanên navnetewî ne ku mafê zarokan, girtin û cezekirina wan bi şeweyekî din daxwaz dike.

Xebatên meclîsa Turkiyê li ser guhertina qanûnê û kêmasiyên wan

Ji ber zêdebûna zexta li ser hikumeta Turkiyê, roja 05.10.2009 pêşniyaza guhertina sê bendên qanûna terorê pêşkêşî meclîse bû. Lê siyasatmedarê Turkiyê, qanûnê lipaşdixin, dereng dihêlin.

Pêşniyazên hatine kirin, kêmasiyên xwe pir in û pirsgirêkê çareser nakin. Pêşniyaz, girtin û cezekirina zarokan ji ber qanûnên "endambûna rêxistinî" û "propogendeya rêxistinî" çareser nake. Her wisa, hasasiyetên taybetî, wek tebîniyên "paşxistina cezeyên zarokan", "derenghiştina biryarên dadgehê" û "çareserkirina bê edaletiya bikaranîna cezekirina zarokan", hemêz nake.

Divê di pêşniyaza guhertina qanûna "zarokên bi qanûnan re dikevin îxtilafê" de, qanûna zarokan endamê rêxistinî dihejmerê, 220 benda 6, 7 an û 314/3 ku rê li ber cezekirina zarokan vedike, cî bigire. Hetanî mirov wan ji holê raneke, çareserîya pîrsê ne mûmkûn e.

Analîza van qanûnan giring e. Dema mirov li ser wan kur dibe dê bê dîtin ku, krîtera bikaranîna aletên şîdetê nebûye cihê pirsê. Lewma di qanûna cezêkirina turka de-TCK, kesên hişkî bikaranîne û nehanîne yek hatiye dîtin. Bi vê yekê, "mafê xwe îfadekirina azad", yekalî anjî bi giştî hatiye qedexekirin. Qanûna 220 benda 6, 7, 8 u ya TCK 314/3 li dijî "Qanûna Bingehîn" ya 13 an e, ku qanûn mafê bingehîn û sînorkirina azadiyê raçav dike û li ser norm û pîvanan radiweste. Cezêkirina kesên ne endam ku şîdet bikar nehanîne bi heman cezeyan cezêkirin, li dijî qanûna bingehîn e. Her wisa qanûnên 220/6, 7, 8 û TCK 314/3 li dijî qanûna bingehîn ya mafê dadgehkirinek bi edalet e.

Qanûna terorê benda 7/2 an cezêkirina propogendeya rêkxistinî, benda 2, şaxa ``a`` yê nixumandin û girtina serûçavan wekî suc formule dike. Guhertin û şikildayîna qanûna li dijî terorê di 2006 an pêk hatibû. Di formulekirina qanûna 7/2 an de banga ji bo şîdetê û pêkanîna şîdetê weke krîter li ber çavan nehatine girtin. Bi şeweyekî din ku mirov bihêne zimên, qanûn, kesên bêyî şîdetê, dîtinên xwe dihênin zimên jî ceze dike. Ji ber dîtinên xwe, kesên dîtinên xwe dibêjin, bi cezeyê propogendeyê têne cezêkirin. Ev qanûn û kirin, li dijî mafê xwe îfadekirina azad e. Ji bo ku zarok qise dikin û naxwazin bêne nasîn, serûçavên xwe dinixumînin, û bi çalakiyên wisa bi qanûnên terorê têne cezêkirin.

Pêşniyaza li meclîsê hatiye kirin, girtina zarokan bi sînor nake. Qanûna TCK 100 banda 3 an cezeyên giştî formule dike. Li gorî qanûnê, şupheyên giran têr dike ku mirov bêne girtin. Lewma heta qanûnê wisa ku li ser bingeha şupheyên rê ji bo girtinê veke hebin, dê girtin û cezêkirina zarokan jî bi dawî neyê.

Qanûna li dijî terorê benda 17 an, kêmkirina cezeyan bi mercan ve girê dide. Li gorî qanûnê zarokên ku ji ber sucên terorê di hepsê de ne, piştî ji 4/3 cezayên xwe di hepsê de derbas kirin, dikaren azad bibin. Lê zarokên li derveyî qanûnê terorê di hepsê de ne, piştî ku 3/2 cezayên xwe di hepsê dubuhurînin dikaren azad bibin. Ev yek bê edaletiya pêkanîna qanûnan eşkere nîşan dide.

Piştî analîza li ser nakokiyên qanûnên Turkiyê bi yê navxweyî û bi peymanên navnetewî re "bi alîkariya hevkarên me ji dezgehên mafê mirovan li Kurdistanê" hate pêşkêşkirin, em dixwazin pêşniyazên xwe pêşkêş bikin da ku meclîsa Turkiyê û raya giştî wan li ber çavan bigirin. Bi pêşniyazên me rewşa zarokên di zindanan dikare baştir bibe û zarok bi hêsanî nikarin bêne girtin û cezêkirin.

Pêşniyazên me:

A- Karên bi zûtirîn wext bêne kirin

- Ji bo ku rewşa bi hezaran zarokên Kurda ku bûne qûrbana qanûnên li dijî peymanên navnetewî, beşek ji wan di zindanê de ne û beşek di ber tehdîta girtinê de ne, çareser û bas bibe, divê daweyên li dijî wan hatine vekirin bi dawî were û zarok bêne azadkirin. Zarokên ku li derveyî wan qanûnan dimînin, bêne berdan, daweyên wan ji dadgehên zarokan re bêne şandin û xebat li wir bê destpêkirin.

- Li Kurdistanê, kesên bi zarokên suçdar dadikevin (dadgeh, dadger, personelên zindanê, hêzên ewlekariyê) di çarçoveya mafê zarokan de bêne perwerdekirin û rewşa zindanên zarokan bê başkirin, pirsên bijîjkî bêne çareserkin.

B- Guhartina qanûnan

- Divê qanûna TCK 220/6, 7, 8 û 314/3 ji hole bêne rakirin, anjî bêne guhertin ku li dijî zarokan neyê bikaranîn. Divê peymanên navnetewî ku maf û berjewendiyên zarokan diparêzin li ber cava bêne girtin û hizirkirina ku "zarok dikarin bibin terorîst" bê jibîrkirin û qanûnên wisa qet neyêne pejirandin.

- Qanûna terorê 7/2 jî ji hole bê rakirin.

- Qanûna TCMK 100/3 ji hole bê rakirin anjî bê guhertin ku li dijî zarokan neyê bikaranîn. Li gorî qanûna mafê zarokan ji nû ve bê rastkirin û li dijî zarokan neyê bikaranîn. Li gorî peymana mafê

zarokan 37/b “dive girtina zarokan weke tedbîra herî dawî be”. Her wisa, dive qanûna parastina zarokan ya 21 ê bê guhertin û temenê zaroktiyê 18 bête nasîn da ku rê li ber girtina wan bê girtin.

Daxwaziya me ji raya giştî:

- Jibo ku rewşa zarokên Kurda di zindanan de û malbatên wan bê dîtin, zaniyarî ji dezgehên însanî û civakî bê girtin, heyetan û şexsan bişînin bakurê Kurdistanê.
- Divê Yekîtiya Ewropa û Yekîtiya Milletan Peymana zarokan ya navnetewî û mafê zarokan cidî bigirin. Zilm û zora li zarokên Kurda heye bibînin û jib o rawestandina wê gavên pêwîst bavêjin.
- Dezgehên însanî û yê din ku li ser pirsê kur dibin, li ser pirsê dest bi xebatê bikin û zextê deynin ser hikumeta Turkiye.
- Em li benda raya giştî ya netewî û navnetewî ne ku, beşdarî kampanya me ya îmezeyan bibin. Di gel zaniyariyê li ser nav, paşnav, meslek, bajar û welatê lê ne beşdarî kampanya me ya îmezeyan bibin û jibo beşdarbûna kampanyayê ji campaign@kurdocidewatch.net re bişînin.

Kurdocide Watch-CHAK
Komîteya Karger ya Navendî